KURDISK

BERMAHIYAN ÇAWA JI HEV VEQETÎNIN

vesar

AVFALLSSELSKAPET I VESTFOLD

ÇIMA EM BERMAHIYAN JI HEV VEDIQETÎNIN?

Pêwîst e ku hemû bermahî ji hev bên veqetandin; ev sûdê dide mirovan û derdorê. Bi saya jihevveqetandina bermahiyan, vegerandina wan bi rêbazên herî guncav pêk tê – û ji wan berhemên nû tên çêkirin. Li herêma Vestfoldê pêwîst e her kes bermahiyên xwe li gorî rêziknameya taybet ya ş aredariya xwe ji hev veqetîne.

BERMAHIYÊN XWARINÊ

HÛN Ê ÇI BIKIN:

Pêwîst e ku bermahiyên xwarinê bikevin nav kîsên bermahiyên xwarinê ku dane we. Devê kîsan girê bidin û wan bixin nav çopdankên ku rengê devikên wan qehweyî ye.

NÎŞE: Pêwîst e ku hûn rûnên ku xwarin pê hatî çêkirin wekî bermahiyên xeternak di nav ş ûş e yan kasikan de bibin îstasyoyên hawirdorê yan jî îstasyonên vegerandinê.

BERMAHIYÊN XWARINÊ HER HEFTE TÊN BERHEVKIRIN

Ji we re kîsên bermahiyan yên nû lazim in?
kîsekî vala yê bermahiyên xwarinê li ser çopdanka derve girê bidin û berhevkarên bermahiyan dê kîsên nû ji bo we daynin wê derê.

PAKÊTÊN PLASTÎK

HÛN Ê ÇI BIKIN:

Pêwîst e ku hemû plastîkên xwarin, vexwarin yan jî tiştên navmalê dikevin navê bi ava sar bên pakkirin ku tu bermahî li ser nemîne. Ava li ser daweşînin û plastîkan bixin nav kîsê plastîkan yan jî plastîkan di nav çentikekê de hilînin. Pêwîst e ku beriya hûn kîs bixin nav çopdanka ku rengê devikê wê keska vekirî ye, devê kîsî girê bidin.

BERMAHIYÊN PLASTÎK 3 HEFTEYAN CAREKÊ TÊN BERHEVKIRIN

Kîsên nû lazim in?
Kîseke vala li ser çopdankekê girê bidin û berhevkarên bermahiyan dê kîsên nû ji we re daynin wê derê.

KAXIZ Û KARTON

HÛN Ê ÇI BIKIN:

Pêwîst e ku hûn kaxiz û kartonan bixin nav çopdankên rengê devikên wan şîn e ango nav kabîna vegerandinê. Heke bermahiyên we yên kaxiz gelek bin, hûn dikarin bêyî ku hûn pere pê bidin çopdankeke mezintir bixwazin.

KAXIZ Û KARTON 3 HEFTEYAN CAREKÊ TÊN BERHEVKIRIN

BERMAHIYÊN ÇOP

HÛN Ê ÇI BIKIN:

Bermahiyên çop – ku ji ber bermahiyên ji hev hatine veqetandin mane – pêwsît e ku bixin nav kîsan û paşê bavêjin nav çopdankên rengê devikên wan gewr e.

BERMAHIYÊN ÇOP 3 HEFTEYAN CAREKÊ TÊN BERHEVKIRIN

Bermahiyên we yên çop gelek in?
Nexwe hûn dikarin ji xwe re kîsan bikirin yan jî bi buhayeke zêdetir çopdankên mezintir bixwazin. Ji bo agahiyên din bi me re têkiliyê daynin.

PAKÊTÊN CAM Û METAL

HÛN Ê ÇI BIKIN:

Pêwîst e ku hûn cam û metalên ku xwarin, vexwarin yan jî bermahiyên navmalê dikevin navê daynin çopdankên li ber dikan yan jî navendên kirîn û firotinê. Ciyên wan li ser salnameya jêkveqetandinê û li ser malpera me hatine nîşankirin.

CAM Û METAL 6 HEFTEYAN CAREKÊ TÊN BERHEVKIRIN

Nîşe: Pêwîst e ku depozîtoya pakêtên cam û metal rasterast li çopdankê bê dayîn; ji bo van bermahiyan kîs nayên bikaranîn.

BERMAHIYÊN XETERNAK

PÊWÎST E KU DAYNIN ÎSTASYONEKE DORHÊLÊ YAN JÎ ÎSTASYONEKE VEGERANDINÊ

HÛN Ê ÇI BIKIN:

Hûn dikarin bermahiyên xeternak belaş daynin îstasyoneke vegerandinê yan jî îstasyoneke dorhêlê. Pêwîst e ku bermahiyên xeternak di nav kîsên xwe yên taybet de bin, yan jî di nav pakêteke din ya destnîşankirî de bin.

BERMAHIYÊN ELEKTRÎK Û ELEKTRONÎK

E-BERMAHÎ

Hemû tiştên ku ji bo bixebitin jê re elektrîk yan jî batarya divên yan jî yên deng û ronahî çêdikin pêwîst e belaş daynin firoşgeheke ku wan alavan difiroşe yan jî daynin îstasyonên vegerandinê.

ÎSTASYONÊN DORHÊLÊ

Ciyên ku pêwsît e hûn bermahiyên xeternak daynin wê derê. Ev îstasyon li ba îstasyonên petrolê û firoşgehên diyar in.

Kilîla vekirina wan li nêzîktirîn îstasyona petrolê, postexane yan jî firoşgehê ye.

Ji bo ciyê nêzîktirîn îstasyona dorhêlê bizanin li salnameya jeveqetandinê yan jî li "www.vesar.no"yê binêrin.

CIL Û TEKSTÎL

Pêwîst e ku textîlên paqij û zuha bixin nav pakêtên devgirtî yan jî kîsên nejid hatine pakêtkirin. Pêwîst e ku wan daynin bankên tekstîlê yên li herêma we yan jî îstasyoneke vegerandinê. Dibe ku hûn li wan deran li gorî kalîteyê, depozîtoyeke cilan yan jî tekstîlê bistînin, û dibe ku cil yan tekstîlên qetiyayî û diriyayî jî bên wergirtin.

ÎSTASYONÊN VEGERANDINÊ

Hûn dikarin berhemên mezintir yên zirardîtî yan jî bikêrnehatî ku nakevin nav şemeya berhevkirina ji malan ku tiştên wekî mobîlya, sarinc, sarinca qerisandinê, PC û bermahiyên baxçeyan di nav de hene, daynin îstasyonên vegerandinê.

DEMJIMÊRÊN ÎSTASYONÊN VEGERANDINÊ VEKIRÎ NE:

Duşem:	10:00 – 18:00
Sêşem - În:	10:00 – 17:00
ŞEMÎ:	09:00 – 14:00

ÎSTASYONA VEGERANDINÊ YA RYGGÊ
Taranrødveien 93, 3171 Sem

ÎSTASYONA VEGERANDINÊ YA LOFTERØDÊ
Mølleveien 30, 3140 Borgheim

ÎSTASYONA VEGERANDINÊ YA NORDRE FOSSÊ
Hvittingfossveien 184, 3089 Holmestrand

ÎSTASYONA VEGERANDINÊ YA GRINDAYÊ
Lågendalsveien 83, 3270 Larvik

ÎSTASYONA VEGERANDINÊ YA SKOPPUMÊ
Adalsveien 22, 3185 Skoppum

KÎ DIKARIN ÎSTASYONÊ BI KAR BÎNIN:

- Pêwîst e ku bermahî yên malên taybet yên takekesan bin.
- Pêwîst e ku kargeh berhevkariya bermahiyên xwe pêk bînin.
- Îstasyonên vegerandinê self-servîs in û pêwîst e ku hûn bermahiyên xwe li gorî cureyên bermahiyên li wê derê tên qebûlkirin veqetînin.
- Bermahî tenê bi otomobîlekê yan jî bi otomobîleke bikod bê anîn. Giraniya herî zêde ya otomobîlê 3,500 kg. me. Nabe ku bermahî bi traktor yan jî kamyonan bê anîn.
- Dibe ku hûn heqê avêtina bermahiyên çop bidin, ango ji bo bermahiyên ne di nav şema-ya vegerandinê de.
- Di serdanên îstasyonên vegerandinê de pêwîst e zarokên li biniya 16 salî di otomobîlê de bimînin.

Sêwirandin: metrobranding.no Wêneyê bergî: Johnny Syversen for Loop

PIRSÊN WE HENE? XWE BIGIHÎNIN ME:

VESTFOLD AVFALL OG RESSURS AS
Taranrødveien 95 B, 3171 Sem

Telefon: +47 33 35 43 80
post@vesar.no
www.vesar.no

vesar
AVFALLSSELSKAPET I VESTFOLD